

Kovara Welat

121 mîn

bîranîna roja  
**ROJNAMEGERÎYA  
KURDÎ**

li we pîroz dike



Mr Mîqdad Medhet Bedirxan

کوردستان  
١٣١٥

( پاره و روزانه جاری نیت خپسندن هر پاره یه کوردی )

( لاری و خپسندن خور و خور و خور و خور و خور و خور و خور و خور )

( لاری و خپسندن خور و خور و خور و خور و خور و خور و خور و خور )

**KURDISTAN**

Adresse : Rue de Carouge, n° 7, GENEVE (Suisse)

میرمقداد مدحت بدیرخان

1 Welat

## PEYVA WELAT

121mîn bîranîna roja  
rojnamegeriya kurdî pîroz be

## Desteya sernivîs

Kovara WELAT  
Çandî- Giştî- MehaneSernivîser:  
Aras YûsivDesteya rêvebir:  
Imran YûsivDizayner:  
Hesen Berzencî

**Têbînî:** mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

2

**D**estpêkê, bi boneya derbasbûna 121 sal di ser derketina yekemîn rojnameya kurdî (Kurdistan) re, li ser navê kovara Welat û desteya wêya sernivîsê rojê li hemû rojnamegerên ku di ragihandina kurdî de kar dikin pîroz dikin, pêşketin û serkeftinê ji hemû dezgehên ragihandina kurdî re dixwazin.

Bi vê boneya pîroz em dixwazin rewşa rojnamegeriya kurdî ya îronî binirxînin. Rojname û kovarên ku îro derdikevin di çi astê de ne?

Gelo rojnamegeriya kurdî rola xwe wek ku jê tê xwestin dilîze?

Çi astengî û pîrsgirêk li pêşiya karê rojnamegeriyê hene?

Îroj ji hemû demên derbasbûyî bêtir derfet peyda bûye da ku rojnamevanên kurd karê xwe bi serbestî bikin, tevî wiha jî hîn sude ji van derfetan nehatiye girtin wek ku tê hêvîkirin.

Piraniya dezgehên ragihandinê yên kurdî bi ser partiyên ve ne, ji lew re nameya wan bêtir guhdanê bi belavkirina raman û îdyolojîya partîtiyê dike, ev yek bandora xwe bi regekî nerînê li rola ragihandinê dike û wê dorî rola ku jê tê xwestin dixîne.

Diyardeyeke din di ragihandina kurdî de tê dîtin,

gellek kesên ku ti girêdana wan bi karê ragihandinê re –ne ji dûr û ne ji nêzîk ve-tinebû, îro roj cihê xwe di nav ragihandina kurdî de digrin, gelo ev kes dê çi sude bighînin ragihandinê ji bilî ziyangihandinê! Ji alîkî din ve, kêmpêdabûna rojnamevanên kurd ên pîspor û têgihiştî di dezgehên ragihandinê de bandora xwe li şîwaz û naveroka nameya wê dike, û asoya pêşxistinê li ber wê teng dike.

Dema em rewşa rojnamegeriya kurdî ya îronî dişopînin em xweziya xwe bi qonaxa HAWAR û RONAHÎYA Mîr Celadet tînin, û ev cihê dax û mixabîniyê ye.

Em bi hêvî ne ku di seberoje de ragihandina kurdî xwe ji van kêmasiyan rizgar bike da ku bikaribe bi rola xwe ya dîrokî ve baştir rabe. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ  
adopt a revolution

## FIRHENG Û HÎNKIRIN DI ZARGOTINA BIÇÛKAN DE



Salihê Heydo

**D**ema mirovek li zargotina biçûkan binêre û hinekî li ser bisekine wê gelek tiştên seyr, balkêş û binirx têde bibîne, nemaze di warê ziman, firheng û wateyan de.

Tevî ku milletê kurd bi sedê salan di nav siyaseta qirkirin, asmîlasyonkirin û qedexeya li ser çand, wêje û zimanê wî hatiye berdewamkirin bi her metodên dijwar û rêkxistinkirî jî lê dîsa bi xurtî û di radeyeke pir bilind de karîbû çand, wêje, ziman û nasnameya xwe biparêze, tevî ku gelek tiştên xwe û tibabekî ne hindik ji yeksên zimanê xwe winda jî kiribû di riya bangêşî, ragihandin û dem û dezgehên desthilatdarên dijminê doze ku pir kêr û bandor li ser zarokan kiribû, dîsa em dikarin wan wan gotin û oeyvên kurdî yên resen û watedar ji zargotina biçûkan derxînin û dîsa wan li firhenga xwe vegeînin.

Lewra em dikarin vê sirûda zarokan weke nimûne bînin ser rûpel dema navê tilîyên destan yeko

yeko dibêjin û her yekê jî erka wê nîşan dikin ku gelek ji mezinên kurdan yên temendar û zimanzan û rewşenbîran navên wan bi temamî nizanîbûn.

Di vê sirûdê de ya binavê Tilî em rastî tiştêkî firhengî tên, ji ber ku xuya dibe ka çawa zarokên kurd di lîstekekê de tilîkên destê xwe yeko yeko dihejmêrin û wan bi nav dikin û her yekê jî kar û barê wê, û reng û rewşa wê bi me didin naskirin û hînîkirinê, çawa tê zanîn ev hînîkirin û naskirin hemî bi helbestî û sirûdkirineke terazûkirî li hevhatî û bi kêş û rêzbendên durist hatiye hûnan û avakirinê, lewra em dikarin bibêjin ku zargotina biçûkan jib o zimanê rast û durist û gotinên windayî jêdereke bingeîn e, çawa li jêr di naveroka vê sirûdê de hatiye gotin ;

Tilî

Tilî tilî

Tilî pênc in

Pêncê sênc in

Pîr û gênc in

1-Qeraqûçik

Tilya biçûçik

2-Meramûçik

Bi zêr û hûçik

3-Dara rime

Keç xanimê

4-Hevderêse

Mastalêse

5-Gird û gijê

Sipîkujê

Her wekî me dît di rêza pêşîn de ji hejmara yekê navê tilîyê ye, û rêza din navê kar û erkê ku pê radibe ji me re şirove dikin heyânî hejmara pêncan.

Piştî ku me ev sirûd şirovekir, em dîsa dikarin  
nimûneyeke din ji folklorê lîstikên zarokan  
bînin ser rûpel û şrove bikin, lê vê care zarok  
me hênî zimanî kurdî û tirkî bi awayekî firhengî  
û sirûdî dikin, gotina kurdî dibêjin û beramberî  
wê ya tirkî jî dibêjin di heman wate û dabêşê  
de, her wiha ev jî bi awayekî li hevhatî bi kêş,  
terazû, rêzbend û bareyên tekûz û durist hatiye  
hûnanê.

Hêjayî gotinê ye ku ev sirûd pir dûr û dêrîn e, çaxa ku zarok dibûn du birr û bend, di şevên havînan de dema ku bênderên pûş û sap li derdorê gund bûn, di wî hingî de zarok ji xwe re bi lîstikan dilîştin weke lîstika veşartoka nav bênderan yan jî lîstika dizan û xwediyê bistên, lewra birrek xwe vedişêrin û birrek dîtir dibin êrîşker, wê çaxê ji dûr ve pêwanên zarokên veşartî, qelawizên wan diz û êrîşkeran dibînin û agahiyê didin hevalên xwe yên veşartî, bi tilama ku vaye êrîşek xurt hate ser we divê hûn ederê xwe û bersivê bidin, di wî hingî de zarok

cihên xwe diguhêzin nav benderên  
dîtir an jî li ber xwe didin û pê re vê  
sirûda jêrîn dibêjin ya bi navê (Hatin)  
ku firhengek bi sirûdî nîşanî me dikin,  
niha ez vê sirûdê bi temamî dadixînim  
da ku hinekî em zîrekîya zarokên kurd  
jî aliyê ziman, çand û wêjeya wî ya  
gelêrî bibînin û sûdeyê jê bigrin.

Hatin

Hatin hatin ev komiz

Komiz êrîş û topiz

Yek sitêr û yek yeldiz

Du dizik û du xirxiz

Sisê sor û sê qurmiz

Çar beran û çar dongiz

Li hedû bûn qelawiz

Tirşo mirşo leymûndiz

Av sû ye, behr û dengiz


Dîkil axa bû xoriz

Li ser koxê bû qurpiz

| Kurdî | Tirkî  |
|-------|--------|
| Êrîş  | Topiz  |
| Stêr  | Yildiz |
| Diz   | Xirxiz |
| Sor   | Qurmiz |
| Beraz | Dongiz |
| Av    | Sû     |
| Dîk   | Xoriz  |

Bê guman ev sirûd li gorî bilêvkirina zarokan ji herdû zimanan hatiye hûnan ji ber ku di qonaxa îro de ev gotinên tirkî guhertin hinekî ji aliyê hin tîpan de bi wan re çêbûye lê dîsa di heman wateyê de ne. ■

# STRANVANÊ ŞEVÊ


**Zekeriya Tamir**

Werger ji erebî : Imran Yûsiv

**D**ikir bibe nîvê şevê bêyî ku Şefîqê Kewa kêlîkê jî lêdana li ûdê û strandina stranekê li dû stranekê rawestîne, li pêşberî komek ji mêrên ku hatibûn mala Mesûdê Zer li ser vexwendineke comerd ji hêla wî ve da ku şevbuhêrkekê heya berê sibehê digel hev biborînin, şevbuhêrkeke dagirtî bi ahing, xwarinên xweş, meya cûrbicûr û çixareyên tijî tûtîn û heşîş.

Bi bêhînfirêhî xwarin xwarin, gelek peyal ji meyê vexwarin, çixare kişandin û bi dengê bilind bi hev re axivîn. Di navbera qelebalixa wan re, her bîstîkê dengê Mesûdê Zer bilind dibû û ji nû ve bi xêrhatina wan dikir û ji wan dixwest ku bê fedî bixwin wek ku ew li mala xwe ne.

Lê Şefîqê Kewa ji wê şevbuhêrkê ne razî bû, tevî wê yekê jî ewî lêdana li ûdê û stran domand heya ku tîlên ûdê ji nişkê ve û ji ber sedemin ne diyar qetiyar, wê gavê stran jî rawestand, hemîyan lê nêrî û matmayî man, Mesûdê Zer bi lez çû cem, Şefîqê Kewa ew dilnîya kir û gotê: Şens û qeder bû, ezê hewilbidim ku bê ûd bistirê.

Ev gotin ne bi dilê Mesûd bû, lewra gotê: Lê berî şevbuhêrkê bazara me ew bû ku tu li ûdê bidî û bistirê, lê eger tu tenê bistirê ezê nîvê kîrê bidim te.

Bi Şefîq nexweş hat lê ji bo ku bi Mesûd re nekeve nava nakokiyê gotê:

Tişte pêwîst li ba min ewe ku mêvanên te kêfxweş bin.

Yekî ji mêvanan bi dengê serxweş bangkir; haho, dengê wî bi ûdê re nedihate tehmûlîkirin û pir nexweş bû, vêca gelo wê çî bi serê me bê ger em li dengê wî tenê guhdar bikin ?

Yekî din bangkir ; Ezê jê xweştir bistrêm û bê pere jî .

Ê sisyan bangkir; Ez jî amade me bistrêm, û heçê ku li dengê min guhdarî bike çiqas pereyan bixwaze ezê bidimê.

Ê çaran jî bang kir ; We navê durist yê hezretî dengbêj bi me neda naskirin..gelo Şefîqê Kewa ye an Şefîqê Ewt-ewta ye ?

Dengê kenê wan bilind bû, û qelebalixa wan zêde bû, Şefîq pir li ber xwe ket û hest bi wê yekê kir ku rûmeta wî hate bînpêkirin û wê hîn bêtir bînpê bibe ger ew bîdeng bimîne, lewra ji Mesûd re got ;

Ger mêvanên te dev ji sixêfên xwe bernedin, û henekên xwe bi min û dengê min bikin, mixabin ez neçarim ji mala te derkevim.

Mesûd bi hêrs û tinazî lê vegerand û got ;

Bê mixabin û bê tişte, tu rêya derî nasdikî yan ez şanî te bikim ?

Şefîq rahişt ûda xwe û ji mala Mesûdê zer derket, di wan xaçîrêkên tarî yên ku digihêjin mala wî re meşiya û nîfret li vê dem û vî çaxê pîs û qirêj yê ku ên wek wî neçarkir ku li pêşberî komek ji serxweşên bêsewdan bistirê anî.

Gava gihişte mal, xwest ku tîlên ûda xwe biguhêre, lê ti tîlên nû li mal nedîtin, li pêşberî neynikeke dirêj rawestiya, û bi dengê nizim ku hin bi hin bilin bû stira, wê gavê şanderek ji koçka xelîfa hat û jê xwest ku li ser fermana Xelîfa divê aniha li ber destê wî amade bibe û jê re bistirê, lê Şefîq xwesteka wî red kir û got ku ewî sûnd xwariye ku ji bilî parsekan ji kesekî din re nestirê.

Xelîfe bi xwe hate cem, bi tena xwe bê pasevan û bê alîkar bû, li ser cilika ku li erdê ramidandî bû rûnişt û li ber geriya da ku jê re bistirê, bersiva Şefîq nehate guhertin, ji bilî parsekan ew ji kesekî din re nastirê, xelîfe gîrîjî û ji Şefîq re got ; Kanîn çavên te ? ma tu nabînî ku aniha ez ne xelîfeyê misilmanan im, lê tenê ez parsekek im, li hinek xweşiyê ji bo dilê xwe yî bitenê digerim.

Xelîfe keserek kişand, derd û kulên xwe li ber Şefîq rijandin û jê re got ku ew her şev xemgîniyeke mêrkuj, azariyeke dijwar û aciziyeke zor dijî piştî ku hezkera wî dev jê berda û dilket dîlekî ji bermaliyên xwe.

Gunehê Şefîq bi xelîfe hat û qebûl kir ku jê re bistirê, xelîfe jî gotê ; Ez tevde guhdarê te me.

Şefîq stira, xelîfe pir şad bû, û jê xwest ku bêtir bistirê, Şefîq nemerdî nekir û li ser dirêjahiya demdirêjin dirêj stira heya ku xelîfe xwe avêt Şefîq û jê xwest ku hinekî stirana xwe rawestîne çiku dilê wî ji ber kêf, xweşî û şadbûnê dikir rawesta, û nema dikarîbû tehmûl bikra. Şefîq bi a wî kir, û demeke dirêj li pesindayînên xelîfe jê re guhdar kir, dûre xelîfe jê xwest ku qebûl bike bibe stranvanê yekem di şahinşahiya wî de, ku ne ji mafê kesekî be ku bistirê heya ku Şefîq ezmûnekê jê re çêbike û rêdanê bidiyê. Gava ku Şefîq dikir bersiva xelîfe bidaya, dengê lêdaneke xurt ji deriyê malê hat, bi nêrîneke pirsyarî li xelîfe nêrî, xelîfe destûr dayê ku derî veke, bi lez diçe derî vedike, polîsekî bêmirûsk li pêşberî xwe dibîne, jê re dibêje ku hin ji cîranên wî bi navenda polîsan re pêwendî kirine û dibêjin ku wan gazîya mêrekî ku di bin lêdan û êşkenciyeke tun de diqêriya ji mala wî bihîstine.

Şefîq matmayî ma, gotinên cîranan red kir û ji yê polîs re got;

Piştî mirina dêya min ji bilî min kesek di vê malê de najî, tu bi xwe dikarî ji vê yekê piştrast bibî, fermo mal mala te ye.

Yê polîs derbasî malê bû, ode bi ode geriya û bi hûrî vexepirand, lê ne mêrê ku lêdan dikir dît ne jî mêrê ku lêdan dixwar, wê gavê bêmirûska riwê wî zêdetir bû, ji malê derket û gunehê wî bi rewşa wan xelkên ku cîranin derewîn bûne bela serê wan hat. ■

### Zekeriya Tamir

*Wêjevanekî Sûrî ye, rojnamevan û nivîskerê kurteçîrokê ye. Di sala 1931 de li Şamê ji dayik bûye, di sala 1944an de neçardibe ku dev ji xwendinê berde û wekî hesinkar di kargehekê de kar dike, dûre dest bi nivîsandina kurteçîrokê dike, pirtûkên wî yên çîrokî Ji bo gelek zimanan hatine wergerandin.*





## يلماز غوني.. الكاتب والروائي والمخرج

مروان شيخي

مواقفه السياسية قضى يلماز غوني ١١ عاماً في السجون التركية، في السجن كتب عدة روايات منها (الأعناق الملتوية - ماتوا و رؤوسهم محنية) وكانت تعبيراً عن حياة الناس القرويين الذين وُلدوا وماتوا في فقر مدقع و في رسالة إلى زوجته يقول غوني :

“حبيبتي، لم تكتب لنا الحياة بأن نعيش عيشاً كريماً في أمن واستقرار، وذلك لسبب بسيط هو أننا نشعر بأحزان الآخرين ونعتبرها آلامنا وأحزاننا، وإننا نتألم لمآسي أناس لم نراهم قط، إن دموعهم تمزق أكبادنا لقد ذرفنا الدموع حتى على القطط وحمينا الطبيعة وأعشاش العصافير، فكم هو جميل يا حبيبتي أن نشارك الأم ومآسي الآخرين وكم هو عظيم أن تساعد أناساً للتخلص من المشقات، لقد تألمت كثيراً في حياتي وذقت العذاب بما فيه الكفاية، ولكن كم هي حلوة وجميلة هذه الحياة. حبي الآخرين وساعديهم واجعليهم يحبونك أيضاً، لا تياسي من الحياة بل لا تجعللي الفرح يفارقك، جابهني آلامك ومآسيك في هذه الحياة بالفرح والسرور”.

في عام (١٩٦٤) مثل يلماز غوني في (١١) فلماً، وفي عام (١٩٦٥) مثل في (٢٢) فلماً وكتب سيناريو (٨) أفلام و آنذاك لُقّب بملك الشاشة القبيح لأنه لم يكن ينتمي إلى الطبقة الأرستقراطية و في عام ١٩٧٦ مثّل أحد أشهر أفلامه (سيدخان) ووصل عدد الذين شاهدوا الفلم إلى ثمانية ملايين مشاهد وهو رقم قياسي لم يصل إليه أي فيلم آنذاك.

في عام (١٩٦٨) تقرر السلطات تجنيده للخدمة الإلزامية ويُساق إلى كتيبة الانضباط كمجنّد علماً انه أنهى دراسته

**يلماز** حميد أوغلو بيوتون أو يلماز غوني ولد في الأول من شهر نيسان عام ١٩٣٧ في مدينة أضنه لأبوين كرديين وهو من عائلة فقيرة جداً، في السابعة من عمر يلماز تزوج والده ثانياً مما أدى إلى المعاناة المستمرة ليلماز بسبب سوء معاملة والده لوالدته حيث يقول غوني خلال إحدى المقابلات الصحفية معه “عشت طفولة سعيدة حتى السابعة من العمر إلى أن تزوج والدي مرة ثانية وهنا فقدت السعادة والراحة في حياتي” وبسبب سوء أحوال والده الاقتصادية اضطر للعمل في قطاف القطن، كما عمل في السقاية وحمالاً، بائعاً للصحف اليومية والبندق والجوز في الشوارع وميكانيكياً في إحدى شركات الإنتاج السينمائي، أنهى غوني دراسة المرحلة الابتدائية، المتوسطة و الثانوية من مراحل دراسته في مدينة أضنه، ليلج بعدها للجامعة التي لم يكملها بسبب أوضاعه الاقتصادية، في السنة الثانية من المرحلة الإعدادية كتب للنشرة المدرسية قصة عن فلاح فقير يأخذ زوجته إلى المدينة قاصداً الطبيب ولم يكن يملك المال أجرة للطبيب، فعرض ديكاً عوض المال على الطبيب يقول غوني “رُفضت هذه القصة بحجة أنها يسارية علماً أنني لم أفهم في ذلك الوقت معنى هذا المصطلح” يسارية.

التحق غوني بعدها في مدينة أنقرة بالجامعة في قسم الحقوق لكنه لم يكمل مرحلته هذه أيضاً، و انضم بعدها لجامعة مدينة إسطنبول قسم الاقتصاد في عام ١٩٥٧، لم يكملها أيضاً لأنه سجن بسبب

## Dîroka xebat û berhemdayîne

# M Î S A E N T E R

## (1919-1992)

**M**ûsa Enter, an jî Apê Mûsa, li gundê Stilîlê yê bi ser Nisêbîna bakurê Kurdistanê ve, di salal 1918an de ji dayik dibe. Hîn zarok bûye bavê wî koça dawî dike. Qonaxa pêşî ji xwendina xwe li Mêrdînê dixwîne, ya bilind li Edenê, di pişt re berê xwe dide Stembolê û li zanîngeha wê mafnasiyê dixwîne, li wir û dema ku wê cudahiya mezin di navbera jiyana xelkên wir û jiyana gelê kurd lib ajar û deverên kurdistanê dibîne, ramanên netewî, welatparêzî û pêşketî cihên xwe di nava hizir û ramanên wî de digirin, lewre dest bi xebatê dike.

Digel grûpek ji xwendekaran komeleyeke çandeyî bi navê komeleya Hêvî ya çandeyî li Stembolê dadimezirîne. Ji bo vî karî desthilatdariya Turk ya faşîst ew û hin rêhevalên wî girtin û avêtin zindanê.

Piştî ku apê Mûsa ji zindanê derket, dest bi nivîsandinê kir, û pirtûkek bi navê Birîna Reş danî, her wiha firhengeke kurdî ku ji 6 hezar gotin pêktê derxist û belavkir.

Di navbera salên 60 û 70 ji çerxê 20 Tevlî partiya çepê Turk dibe û tede xebatê dike, ji ber vê yekê cardin tê girtin û zindankirin.

Di sala 1976an ji zindanê derdikeve, û berê xwe dide gundê xwe, sê salan li gund rûdine.

Bi pêşketina tevgera rizgarîxwaziya kurdistanê re, apê Mûsa vedigere warê siyaseta nivîsandin û rojnamevaniyê û xebata xwe bi wêrekî û mêranî didomîne.

Cardin dev ji gundê xwe berdide û berê xwe dide Stembolê, û bi rengê çalak û xurt dest bi nivîsandina gotarên siyasî dike ku di wan



de siyaseta dewleta Tirk di der barê gelê kurd de rexne û tazî dike, û gotarên xwe di gelek rojnameyên Turkî de- ji nav wan(Welat Olke û Ozgun gundum)-diweşîne, li kêlekê jî bîranînên xwe dinivîse.

Ji ber ku gotarên apê Mûsa di nav xwîneran de pir dengvedida, ew jî alî hêzên ewlehiyê yên desthilatdariya Turkiyê ve armanc hate girtin.

Di 20 êlûna 1992an de, li kolanekê ji kolanên Amedê, ji hêla grûpek faşistan apê Mûsa hate şehîd xistin û digihêje karwanê pakrewanên doza kurd û kurdistanê.

Hêjayî gotinê ye ku apê Mûsa di gotarên xwe de pir bal dikişand ser azadiya jina kurd û rola wê di xebat û tekoşîna tevgera azadîxwaziya kurdistanî de, her wiha roleke pir girîng di tevgera rojnamegeriya kurdî de lîst.



**Berhemên nemir Mûsa Enter**

-Birîna Reş - sala 1959an

-Ferhenga Kurdî- sala 1967an li Stembolê

-Bîranînên min beşê yekem- sala 1991ê li Stembolê

-Bîranînên min beşê duyem- sala 1992an li Stembolê

-Çinar û pirtûkin din digel gelek gotarên rexneyî.

Jêder ; Enternê



# FEREC DERWÊŞ

“Ez gelekî difikirim berî  
ku gava xwe bavêjim, û ez  
bi tirs û berpirsî nêzîkî  
berhemdayînê dibim.”

**Hevpeyvîn:** Imran Yûsiv

10

Di sala 1984an de li bajarê Amûdê ji dayik bûye, xwendina xwe ya seretayî li Amûdê, ya navendî li Amûd û Heseke bi dawî dike, derçûyê kolêça mûzîkê ye sala 2012an, 7 berhemên wî di warê mûzîk û stranê de heya aniha derketine, di nav wan de du kilîp hene, wekî mamoste di fêrkirin û hînkirina mûzîkê de kar dike, aniha li peymangeha Mezopotamyayê wekî mamosteyê mûzîkê kar dike û li bajarê Heseke rûdine.

-Çîroka we û mûzîkê kengî û çawa destpêkir, di der barê wan destpêkan de hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

-Ji zaroktî ve min ji hunerê bi giştî hez dikir, çi wênekêşî be çi jî stran û mûzîk be heya bi şano û lîstikvanyê jî. Di navbera van huneran de min bêtir xwe di mûzîkê de dît. Di temenê 14 saliya xwe de min biryar da ku divê ez fêrî tembûrê bibim, wê hingê xalê min ez fêrî tiştên sereke û bingehîn di tembûrê de kirim, jê pêve min çar salan berdewam li tembûrê da û min bixwe xwe fêrdikir, piştî amûra kemanê bala min pir

kişand, her ku ez di ber cihê amûrên mûzîkê re derbasdibûm, ez radiwestiyam û min demeke dirêj li vê amûra nazik û ciwan ya ku li paş camê daleqanîbû dinêrî, bi rastî ez dilketêmê. Min kemanê ji xwe re anî û min xwe fêrî lêdana wê kir, her wiha min bingeha noteya mûzîkê ji cem hevalekî xwe ku navê wî Rêzan Yûsiv e anî û li gorî wê min xwe fêrî nota jî kir, piştî û digel hin hevalan me komek mûzîkê ava kir ku navê wê Narîn bû, û grûpek din jî bi navê seba bû, bi van koman em dediketî newrozî û me mûzîka xwe pêşkêşdikir, her wiha di aheng û helkeftan de jî em amade dibûm, heya li navenda çandî ya fermî li Heseke jî me çend aheng li darxistin, di seyran û çalakîyan de jî me mûzîka xwe pêşkêşdikir. Piştî wê, ez çûm kolîça mûzîkê, min mûzîk xwend û wekî pisporê amûra kemanê jê derçûm.

-Têzanîn ku di nav kurdan de amûra tembûrê bêtir belav e, bo çi we keman bijart, cudahî tembûrê çi di vê amûrê de we kişand ?

-Ez li tiştêkî digeriyam lê min di tembûrê de nedidît, ew tişt di kemanê de min dît, dengê kemanê çawa ye ! ew dikare bêtir êş û xemgîniyê derberîne, li hemberî wê tiştin di tembûrê de hene tu di kemanê de nabînî, her amûrek

taybetmendiyeke xwe heye. Ji hêleke din ve min xwest amûreke nû bi karbînim ku ewqasî di nav kurdan de nehatiye belavkirin ne wekî tembûrê ku her kes lê dide. Dema ku min rahişt kemanê li tevahiya Heseke çar-pênc jenyarên kemanê tenê hebûn, lê bêtir deng û şîwazê wê ez kişandim, keman amûreke azad e, tu çi dengî bixwazî tu dikarî jê derîni. Û ji ber ku perdeyên wê tinene, lewre tu bi azadî jenyariyê li ser dike, tevî vê yekê ez li tembûrê jî didim û min dev jê bernedaye.

-Di warê jenyarî û stranbêjiyê de, hûn bêtir bi kê bandor bûne ?

-Min li gelek strabêjan guhdarî dikir mîna Mihemed Şêxo, Şivan, Diyar, Serhed, Seîd Yûsiv, Tehsîn Taha, Ciwan Haco ....hwd, ev ji hêla denbêjiyê ve, ji hêla mûzîkê ve dema ku min keman anî min pir li Dilşad Seîd guhdarî dikir û ez pir jî bi wî bandor bûm.

Di destpêka xwe de min li kîjan hunermendî guhdarî dikir diketim bin bandora wî û min lûsekirina wî dikir, piştî wê min xwest ku tiştêkî taybet bi xwe çêbikim û hîn ez di vê hewdanê de me.

-Xwendina mûzîkê bi taybet ya kolîçê çi li we û behreya we zêdekir ?

-Gava ku me karê mûzîkî li Heseke dikir, me digot belkî di warê mûzîkî de em pir ciyawaz û lipêş in, lê dema çûm kolîça mûzîkê min astîne pir bilind di mûzîkê de dîtî, tevî ku berî biçim min stranek jî çêkiribû û belavkiribû. Lewra me xwest di warê teknîk û zanyariyan de bêtir xwe lipêşbixînin, her wiha me gellek sûde girtin ji wan çalakiyên ku em bi wan radibûn wekî ezmûn û wekî aheng.

-We got ku we lûsekirina gellek hunermend û dengbêjan kiriye, kengî Ferec Derwîş taybetmendiya xwe dît ?

-Rastî ez hîn di nava hewldanê de me, hîn ez di bin bandoran de me, tevî ku hinek kes ji min re dibêjin ku tîp û şîwazê min xuya ye, lê ez vê yekê di xwe de nabînim, ez dibêjim dibe ku 30% ji taybetmendiya min a hunerî derketiye holê, lê ev ne bes e da ku ez bibêjim

ku ez bûme xwedî şîwazekî hunerî, hîn qonaxek li pêşiya min maye divê ez derbas bikim.

-Wekî mûzîkjenekî akadîmî, hûn rewşa mûzîka kurdî li rojavayê kurdistanê çawa dinirxînin ?

-Ji alî jenyariyê ve û guhdana gel bi fêrbûna mûzîkê, îro roj di asteke herî bilind de ye, ji ber pîrbûna peymangehên mûzîkî li devera me hejmarek pir mezin ji jenyaran çêbûne, di ti demê de ev nebûye, lêbelê ji alî dengbêjiyê ve hîn em li paş in, ji ber ku peymanên taybet bi fêrbûna dengbêjiyê li rojavayê kurdistanê hîn peyda nebûne, wek ku em dizanin dengbêj gelek xwendin û rahênan jê re divê, têrê nakê ku yek tenê li mal bistrê da ku bibe dengbêj, em bi hêvî ne ku di demên pêş de guhdan bi dengbêjiyê bibe weku guhdan bi jenyariyê bûye.

-Çi berhemên we di warê mûzîkê de hene, û ji bo pêşerojê we çi amade kiriye ?

-Heya niha 7 berhemên min derketine, di nav wan de du kilîp hene, ew jî evin ;

-Strana (Piştî vê evînê) ji gotinên Fewaz Şêxo bû, berî xwendina kolîçê min çêkir.

- Strana (bajarê min) di 2013an de min çêkir.

- Strana (Li benda te) ji gotinê Ciwan Şerîf bû, di 2014an de min çêkir.

- Strana (Gava li cem te bim) ji gotinên Xalid Omer bû, di 2015an

de min çêkir.

- Strana (Welatê min) ji gotin û awazên min bû, di 2017an de min çêkir.

-Strana (Gula min) ji gotinên Nûh Silêman bû, di 2018an de min çêkir.

Ez gelekî difikirim berî ku gava xwe bavêjim, û ez bi tirs û berpirsî nêzîkî berhemdayîne dibim.

Aniha ez amadebûna klîpeke nû dikim, wekî din jî çar stranên min hene dixwazim wan tomar bikim, ji alîkî din ve em karê avakirina orkistrayeke mezin û berfireh dikin ku taybet bi mûzîka rojavayî be, û yeka din jî ku taybet bi mûzîka rojhilatî û kurdî be, em dixwazin hejmareke mezin ji amûrên mûzîkê derbasî wan bikin. ■



## يلماز غوني.. الكاتب والروائي والمخرج

– عام ١٩٦٧ : جائزة أفضل ممثل لدور الرجال في فيلم (قانون الحدود) في مهرجان أنطاكية

– عام ١٩٦٩ : الجائزة الثالثة عن فيلم (سيد خان) في مهرجان أضنة وجائزة أفضل ممثل لدور الرجال في فيلم (سيد خان).

عام ١٩٧٠ : جائزة أحسن فيلم عن فيلمه (الأمل) وجائزة أفضل ممثل لدور الرجال في نفس الفيلم وجائزة أفضل كاتب سيناريو للسنة، كذلك جائزة أفضل فيلم وأفضل ممثل لدور الرجال عن فيلمه (القبیح) في مهرجان أنطاكية.

– عام ١٩٧١ : الجائزة الأولى لمهرجان أضنة عن فيلمه (المريثة) الجائزة الثانية عن فيلمه (الأمل) الجائزة الثالثة عن فيلم (اليأس).

– جائزة أفضل كاتب سيناريو للسنة، وجائزة أفضل مخرج للسنة أيضاً وجائزة أفضل ممثل عن دور الرجال.

– عام ١٩٧٢ : الجائزة الأولى عن فيلم (الأب) في مهرجان أضنة، وكذلك جائزة النقاد في نفس السنة عن نفس الفيلم، كذلك جائزة أفضل ممثل لدور الرجال عن نفس الفيلم أيضاً جائزة الحكام الخاصة عن فيلم (الأمل) في مهرجان غري نول العالمي.

جائزة النقد العالمي عن فيلم (المريثة) في مهرجان فينيسيا الدولي.

عام ١٩٨١ الجائزة الكبرى عن فيلم القطيع في المهرجان السينمائي العالمي (سويسرا)

مات في باريس بمرض عضال يوم ٩ أيلول ١٩٨٤ ودفن في مقبرة العظماء (ببير لاشيز)، وقال في آخر حواراته : “لم يكن هدفي من الحياة مزاوله الفن، بل محاولة تحرير شعبي من خلال هذا الفن

الثانوية التي ترشحه لرتبة ضابط التي حُرِمَ منها بسبب الأحكام الصادرة بحقه.

يعتبر فيلمه “الطريق” أحد أنجح أفلامه و هو الفيلم الذي صور نصف مشاهده من السجن حيث كان يعلم ويلقن رفاقه عن الزوايا التي يجب أن تتخذها الكاميرا و عن السيناريو و الحوار والفيلم بأكمله يتحدث عن الحياة القاسية للأكراد القاطنين في المناطق الكردية في تركيا و من الأفلام الأخرى التي بدأها غوني من سجنه و أنهاها أصدقاءه : القلق ١٩٧٤ ، المساكين ١٩٧٥

وقد أخرج أفلاماً كثيرة من داخل السجن أذكر منها : الإجازة ١٩٧٥ ، حتماً سيأتي الموت ١٩٧٥ ، القطيع ١٩٧٨ ، العدو ١٩٧٩

في عام ١٩٨١ هرب يلماز من سجنه و فرّ إلى اليونان و حاول الحصول على اللجوء السياسي في سويسرا لكن الأخيرة رفضت و أفلحت محاولته في الحصول على اللجوء في فرنسا، سنة ١٩٨٢ تم تجريده من الجنسية التركية، أخرج في فرنسا أحد أهم أفلامه “الجدار

ولم يكن غوني فقط سينمائياً لامعاً إنما أيضاً كان كاتباً للرواية والقصة القصيرة و معظم أفلامه هي من تأليفه : أهم مؤلفاته، كتبه ورواياته :

- الموت يناديني

- ثلاث حقائق للظلم الاجتماعي

- ماتوا ورؤوسهم محنية حازت هذه الرواية على جائزة أورهان كمال عام ١٩٧٠ وهي أرفع جائزة أدبية في تركيا، هذه الرواية مترجمة إلى اللغة العربية.


- المتهم

- غرفة سجنى أو

- صالبا وهي من أهم روايات غوني والروايات العالمية الخالدة نشرها في عام ١٩٧٥ وشرح بسببها إلى جائزة نوبل، وهي أيضاً مترجمة إلى العربية.

– استطاعت أعمال غوني نيل العديد من الجوائز العالمية والمحلية التركية

حيث نال فيلمه “الطريق” على جائزة السعفة الذهبية في مهرجان (كان) السينمائي العالمي الخامس والثلاثين.



FERHENGOK

|                   |                       |
|-------------------|-----------------------|
| gezo              | المن و السلوى         |
| gede              | فتى في مقتبل الشباب   |
| gêdûk             | طريق ضيق              |
| gêr               | مساحة محدودة من الأرض |
| Girepêç- babelîsk | زوبعة                 |
| girêbest          | عقد                   |
| gulîvank          | شراشب                 |
| gelemşe           | مختلط                 |
| gidî              | عديم الشرف            |
| gileh             | غنيمة                 |
| Giwa-govan        | شاهد                  |
| azoxe             | مئونة                 |
| Bahor-bapêş       | الرشح و الزكام        |
| berpal            | متكى                  |
| cawîdan           | أبدي- أزلي            |
| col               | خليط غير متجانس       |
| çelûz             | مُلح                  |
| çerez             | مكسرات                |
| çilk              | نقطة ماء              |
| çesipandin        | إثبات                 |





## ÇAYXANEYA KEWÊ

Efsan Kurdî



Ji ber gelek xelik derketine derve. Lê çi kesê ku serdana vê çayxanê dike hin bîranînên wî têde hene, dema ku dibînin çayxane girtî ye diçin deriyê zeviya çayxanê yê li paşî vedikin û lê rûdinin.

Derbarê çima ev çayxane ji berya 70 salî ve heya dema niha nehatiye guhertin ez dibêjim kevnahiya avahiya wê dihêle xelik bêhtir lê kom bibin.

Ahmedê Hejî yek ji kesên ku serdana vê çayxanê dike ye, ji me re axivî û behsa bîranînên xwe kir;

Ji berya 15 salan ve tîmê vê çayxanê, dost û heval li vir hev û dû dibînin û demin pir xweş digel hev derbas dikin, henek û qerfan bi hev dikin.

Ev çayxane bûye beşek ji jiyana me, gelek dostên me yên ku em li vir li hev komdibûn çûne ber dîlovaniya xwedê, û gelek çîrokên me li vir hene Ez ji 8ê sibê tîmê vê çayxanê heta ku tê girtin dimînim, ez ti karî nakim, jixwe yên wek min nema kar ji wan tê û nema dikarin kar bikin, temenê me mezin bûye.

Ji bo avahiya vê çayxanê ku heta niha ji axê ya, ez vê yekê xweştir dibînim, çiku zivistanan germ, havînan jî hênîk e, ji aliyeke din ve jî wekî avahiyeke dîrokî ye ku li Amûdê hatiye naskirin. ■

Çayxaneya Kewê li bajarê Amûdê kevintirîn çayxane ye, ew bixwe ji bo xelkên Amûdê bûye mîna navnîşanekê.

Ji berya 80 salî, ev çayxane bi destê Mihemedê Kewê hatiye avakirin ku navê vê çayxanê li ser navê wî hatiye naskirin.

Ev çayxane ji wê dema ku hatiye avakirin ta roja îro tu guhertin li avahiya wê nebûye, hîn ew bi dîwarên kelpîç û tîrkan û heriyê ye.

Tevî hebûna hin çayxaneyên nûjen li bajarê lewma ew gelek bi nav û deng e, û bûye navnîşanek li Amûdê, Piştî ku bavê min çû ber dîlovaniya xwedê, min kar bi destgirt.

Em dikarin bibêjin ku piraniya Kesên ku li çayxanê rûdinin bi rengekî rojane lê dewam dikin, gelek çîrokên û bîranînên wan li nav çar dîwarên çayxaneyê yên ax hîn dijîn.

Kurê Mihemedê Kewê ji me re axivî û got:

Ji berya 70 salî bavê min Mihemedê Kewê Ev çayxane avakir, hemû avahiya wê ji heriyê ye.

Ev çayxane kevnetirîn çayxane li bajarê Amûdê ye lewma ew gelek bi nav û deng e, û bûye navnîşanek li Amûdê, Piştî ku bavê min çû ber dîlovaniya xwedê, min kar bi destgirt.

Tenê li vê çayxanê qehwe, çayê û lîska bi kaxezan e.

Piraniya xelkên ku tîmê me me xwedî temenên mezin in.

Tevgera li vê çayxanê nabe wek demên berê, ew jî





## البحث عن لقمة العيش بين حاويات القمامة.. وجه آخر لبشاعة الحرب

تقرير مجلة ولات

الخاصة التي يحمل عليها تلك الأغراض العتيقة التي يبتاعها من الناس بثمان زهيد و كان عمله يعود عليه بريع جيد ففي كل البيوت كانت توجد أدوات معطلة أو قديمة وقد أصبحت عبئا على أثاث البيت فتبيع ربة البيت هذه الأشياء الزائدة لهذا الرجل الذي كان يساعد في تخفيف أعباء سيدة البيت.

أما عمل هؤلاء الأطفال فهو مختلف تماما وفيه الكثير من الإتهان لطفولتهم و إنسانياتهم.

يقول (ع - ع) و هو أحد الأطفال النازحين من قرى في ريف الحسكة و يسكن مع عائلته في الخيم أنهم و مع بزوغ الشمس يتجمعون حول مكبات النفايات و ينتظرون جرارات البلدية التي تحمل نفايات البلدة و ما ان تصل تلك الجرارات و تقوم بتفريغ حملاتها حتى يشرع الأطفال في البحث بين تلك النفايات عن قطع البلاستيك و النحاس و علب الكولا، يجمعونها و يضعونها في أكياس من الخيش ثم يحملونها على ظهورهم ليبيعوها فيما بعد .

و لا يقتصر هذا العمل على الذكور من الأطفال بل أن الفتيات من الأطفال أيضا يمارسن هذا العمل و يساعدن أخوتهن الصبية في عمليات البحث و الجمع بين القمامة. تقول الطفلة (م) التي لا يتجاوز عمرها العشر سنوات إنها تعمل مع أخوتها الصبية و تتجول معهم في رحلة البحث عن ما يمكن بيعه سواء في حاويات القمامة أو في الأزقة و الحواري و هي بذلك تساهم في جمع أكبر كمية من الأشياء التي يمكن الاستفادة منها.

حول هذه الظاهرة المدمية للقلب يقول الناشط الاجتماعي عماد احمد أن أهم أسباب ظهور هذه الحالة هو عدم قيام المنظمات المدنية القاطنة في هذه المناطق بتقديم المساعدة لعائلات هؤلاء الأطفال و تركيز كل عملهم على مساعدة النازحين المقيمين في مخيمات الهول و الشدادة وغيرها و حرمان العائلات النازحة إلى المدن من كل أشكال المساعدة مما يضطرها القيام بأي عمل مهما كان كي تؤمن لقمة عيشها.

البحث عن لقمة العيش في وسط مكبات النفايات مع استمرار المقتلة السورية و استمرار آلة القتل والدمار في الدفع إلى التشرد واللجوء هو وجه آخر من وجوه الحرب البشعة.

أطفال و لكن أشباه رجال طحنت الحرب طفولتهم قبل أن يتعرفوا معناها أو يذوقوا طعمها، الحرب التي انتزعتهم من مناطقهم عنوة لتلقي بهم إلى المجهول بحثا عن أمكنة أكثر أمنا، أطفال بعمر الورود تركوا خلفهم منازلهم ودفاتر دراستهم، تركوا ألعابهم ، ذكرياتهم و أحلامهم الصغيرة و هاموا على وجوههم طالبين البقاء على قيد الحياة و فقط البقاء أحياء.


هنا على أطراف مدينة عامودا خيم منصوبة تسكنها عائلات نزحت من قرى الحسكة بعد أن دمرت الحرب قراهم يمتن أطفالهم مهنة التجول بين الأزقة و الأحياء و البحث بين مكبات النفايات عن أي شيء يصلح للبيع كالعلب البلاستيكية و مواد قد تحتوي على النحاس أو غيرها عليهم يحصلون بثمانها على بعض الطعام الذي يسدون به جوعهم. تبدأ رحلة البحث هذه قبل بزوغ الشمس حيث يتوجهون بداية إلى الحاويات و مكبات النفايات لعل الحظ يحالفهم في العثور على ما يستحق بيعه، ثم ينتقلون ببحثهم إلى حدائق البيوت و أفنيئها ليلتقطوا ما يتيسر لهم من ملابس قديمة و ممزقة مما قد رماها أصحاب الدار أو يعثروا على ألعاب أطفال مكسرة أو معطلة، أو بعض المواد المستهلكة من الفافون والناليون والأحذية المنهثة و لعل أهم ما يقومون به هو جمع علب المشروبات الغازية الفارغة .

هؤلاء الأطفال يقومون بعملهم هذا غير آبهين بأحد و بكل ما يدور حولهم، همهم الوحيد هو الحصول على لقمة العيش و لا شيء سواه.

سابقا كان يطلق على ممتن هذه المهنة ( أبو العتيك ) فمن منا لا يذكر صوته وهو يصدح كل صباح (قناني نايون...نحاس للبيع..برادات غسالات للبيع...)

لكن كان صاحب هذه المهنة محترفا له أدواته و عربته





## LI QAMIŞLO, 4MÎN MIHRÎCANA ŞANOYÊ YA Ş.YEKTA HATE LIDARXISTIN

Rapor : Kovara Welat

16

**N**apilyon Bonabêrt dibêje;

"Şanoyekê bide min ezê miletekî bidim te."

Dema mirov bixwaze asta pêşketin û bîrweriya miletekî bipêve divê berî her tiştî li asta şanoya wî binêre, bêguman ji bo şaristaniya gelan şano berztirîne nîşan e.

Kar û xebatên Şanoya kurdî li Rojavayê kurdistanê demeke dirêj di bin darê qedexebûnê de, bi dizî û di odayên tarî de dihatin kirin.

Ew kar û xebat bi giştî girêdayî komên Folklorî bûn û ji bo ahenga cejna newrozê bûn.

Piştî 2011an, şano li Rojavayê Kurdistanê ji bin darê qedexeyê derket û ber bi asoyeke nû ve gav avêtin.

Li jêr siya Rêveberiya xweser, desteya çandê guhdaneke taybet bi şanoyê kir, gelek komên şanogerî hatin avakirin, û ya ji hemiyar giringtir ew bû ku mihrîcaneke salane û taybet bi şanoyê hate lidarxistin.

Di 27ê adara 2015an de û di roja cîhanî ya şano de yekemîn mihrîcana şano bi navê Şehîd Yekta hate lidarxistin, û hemû şano li ser dika navenda Mihemed Şêxo ya li bajarê Qamişlo hatin pêşkêşkirin.

Îsal jî, di 27ê adarê de û li jêr durîşma Vedenga Zeytûnê, 4mîn mihrîcana şanoyê hate lidarxistin ku 2 kom ji Efrînê jî beşdarî mirîcanê bûn.

Di de rbarê vê mihrîcanê de nivîskar Imran Yûsiv ku ew endamê komîta xwendina deqan bûye ji kovara Welat re axivî û got ;

"Di mihrîcana îsal de 4 komîte hatibûn avakirin (komîta amadekar-komîta xwendina deqan-komîta dîtinê-komîta nirxandinê)

Di komîta xwendina deqan de em 3 kes bûn, ji nav 21 deqên ku hatibûn ji me re, 17 hatin qebûlkin, bijartina me li gorî asta wan deqan û pêkanîna mercên bingihîn yê deqê şanoyê bû, piraniya deqan ji şanoyên erebî û cîhanî hatibûn wergerandin, ji bilî 2 şanoyên bi zimanê erebî ku ji alî komên Reqayê û Çelaxa ve hatibûn pêşkêşkirin.

Di qonaxa duyemîn de komîta dîtinê li pêşkêşkirina hemû şanoyan nêrî û ji nav 17 şanoyan 9 şano ji bo beşdarbûna mîhrecanê bijartin.

Karê herdu komîtan berî destpêka mihrîcanê bû.

Di 27-3-2019an de mihrîcan hate vekirin, rojane şanoyek di hate pêşkêşkirin û piştî her şanoyekê ew şano ji alî temaşevanan ve di hate nirxandin û gengeşekin.

Bi dîtina min şanoyên ku îsal beşdarî mihrîcanê bibûn ji alî mijar û şîwazê ve rengereng bûn lê bi giştî girêdayî cîweriya me bûn, ji alî asta hunerî ve ez dikarim bibêjim ku hemû ne di yek astê de bûn, lê bi giştî asta mihrîcanê cihê şanaziyê bû, tevî ku tîbîneyên min li ser roja dawî hene

ji alî bi rêxistina wê rojê û pîvanên komîta nîrxandinê di belavkirina xelatan de lê dîsa dibêjim ku mihrîcanên bi vî rengî dikevin xizmeta pêşxistina şanoya kurdî li Rojavayê Kurdistanê."

Derhêner Mihemed Resol ku ew yek ji beşdarên mihrîcanê bûye nerînên xwe anîn ziman û got;

"Bi dîtina min, di vê mirîcanê de sê-çar şanoyên baş hebûn, û di her şanoyekê de jî lîstikvanin ciyawaz hebûn, lê mixabin komîta nîrxandinê gelek lîstikvan piştguh kirin.

Gelo dibe di mihrîcanekê de baştirîn şano tinebe, û ev xelat bê bi dûr xistin !?

Gelo nîrxandina wan li ser çî pîvanê bûye !?

Çima xelata baştirîn lîstikvana jin rola duyemîn hate bi dûr xistin, tevî ku herî kêr çar-pênc jin hebûn hêjayî xelatê bûn !?

Îsal hejmarek mezin ji jinan di şanoyan de dilîstin û ev ji bo me cihê serbilindiyê ye, lê mixabin komîta nîrxandinê mafê van jinan xwar . û gelek ji wan ji vê yekê dilgiran bûn.

Heya bi xelata baştirîn lîstikvanê mêr rola duyemîn jî nehate dan !

Ev tevde cihê lêpîrsînê ye.

Çendî min mihrîcanên şanoyê dîtine û di wan de beşdar bûme, qet ev şîwaz ji belavkirina xelatan min nedîtiye . ev tê wê wateyê ku komîta nîrxandinê ne di asta berpirsyariyê de bû.

Bi dîtina min komîta nîrxandinê roleke nerînê lîst û ev rol dê ziyanê bighîne tevgera şanogerî li Rojava. Û divê li ser van kêmasiyan em rawestin da ku careke din dubare nebin."

Lîstikvan Şêrwan Mele ku xelata baştirîn lîstikvan di mihrîcanê de wergirt ji kovara welat re axivî û got ;

"Ez endamê koma Serdem im, em bi şanoya (Tu ne gara yî) beşdarî 4mîn mihrîcana Ş.Yekta bûn, ez bi rola Gara rabûm di lîstikê de, û min xelata baştirîn lîstikvan li ser vê rolê wergirt.

Bi rastî me encamin baş ji vê fîstîvalê girtin, gelek kom beşdarbûn, ji bajarê Efrînê û hemû bajarên din hebûn, me gelek şanoger dîtin û naskirin, me karê wan jî dît û me gelek sûde jî ji wan wergirt, her wiha me şîwazî nû jî di şanoyê de dîtin.

Bi giştî, ez dikarim bibêjim ku fîstîval baş derbas bû, lê hinek kêmasî jî hebûn, yek ji wan bidûrxistina xelata baştirîn şano bû, bi dîtina min ev biryareke ne durist bû, ji ber ku ji nav 9 şanoyan divabû baştirîn hebaya.

Bi hêvî me ku di demên pêş de şanoya kurdî li pêş bikeve, û bibe bersiva hêvî û serkeftinê gelê me."

Hêjayî gotinê ye ku navên Şanoyên beşdar di 4mîn mihrîcana şanoyê a Ş.Yekta de ev bûn ;

- Donkîşot (Amûdê)
- Çiyayê kurmênc (Efrîn)
- Desteserkirin ( Amûdê)
- Gurî ( Rimêlan )
- Hêviyên dayikê ( Serê Kaniyê )
- Jina bi tenê (koma Kevana Zêrîn –Qamişlo)
- Mirina kew (Koma Şano-Qamişlo)
- Tu ne Gara yî (Koma Serdem)
- Leylet Alrehîl welmîlad-bi zimanê Erebi (Reqa)





## ŞEVBIWÊRK

Narîn Omer

Were

Em şevbiwêrkên  
ber fireh lidarxîn û  
hemî rahêjalên  
evîniyê lê bicivînin  
wekî Evdalê Zeynê û Gula keşê  
Sê şev û sisê rojan  
li pey hev êrîşa serxweş û  
mestvexwar em ê berdîn li  
ser lîsên xewa giran  
Pirek bê dawî emê damezrînin  
di navbera çav û razanê de  
Hemî helbestên xweş û nexweş  
emê birêsin  
Gava xunava zelal  
li ser eniya tebi çirîse  
ezê ji te bixwazim  
Qulingeke çengsikestî û

hemî êş û janên xwe binalîna  
wî re emê bilorînin mîna Evdal û  
tevlî xwenerojên wî bibin  
di gemiya Dêrika rengîn de  
Ez ê sîbera te di dilê seqlanê de  
noq bikim û bavêjim himbêza  
Pira Fafîd  
Bi wan birînen derman dayî  
ji rondikên min û te  
emê zummêna kûr berdîn û  
hemî kulîlkên dilbuhar  
bi leyizînin  
Çeqçeqa baskên Pirpriîkan  
wê keserên me bi firînin û li  
hawîr dor goraBeko bi civînin  
DemaQulingê dil birîndar  
derbasî laleşa pîroz bibe  
emê kevirê bextdana xwe  
di agirdana wî de bi kolin û  
Peymana kirîvatiya saxlem  
em ê bineqîşînin. ■





## رقصة للغرباء

محمد رفي

يسعف ما لديه روعة النفس  
لحظات غائبة حين يتوقف مسافر مثلي  
ويمدح ما لديه كجميلة مثلك  
أزحف نحوك في تساؤلات العالم  
لايستع ان يكون وداعا  
حين يقولها غبار شفتيك  
حديث حب  
تركت العالم على كذبة  
لا أبدو شامخا في متعة الفراش  
ضائعة لا محالة في ذروة تحملني عنوة  
لا أتأمل الجدل في ذكرى عاتمة  
ودعت آتامها في شعري  
الكثيف بلومه  
يحيط بألمى المجنون  
في قلب يأتي عفته في يوم وليلة  
لا يسمع نجما سواك !.

ليس لي في جمال الأحياء  
لا تكون الحياة سكرانة  
في برهة عين  
كيفما تأتي المصائب  
وأنتخيل حالي بنظرة محكوم  
أمام المرأة مثل برواظ قديم  
في بهجة الأصابع وهي تخفي رقصة  
الغرباء في منازل رخيصة  
كانت الجدران كافية تطوي ايامي  
ليس لها صدق في عينيك  
تذوب بحسرة مترفة  
أنا لا أحب أنثى تكون لرجل آخر  
استراحة لقبلاته  
يقطف منها فرصة للضحك  
في تجديد الحياة  
وانا كنت صباحك الأشد  
ومساؤك كانت الروح وقتها





# LI QAMIŞLO, 4MÎN MIHRÎCANA ŞANOYÊ YA Ş.YEKTA HATE LIDARXISTIN



welatpress2014@gmail.com  
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٦٢) ٢٠١٩/٥/١ م